Nivîsa ji

navîgasyona dibistanê

Pişti dibistanê diçî ku derê?
Alîkariya oryantasyonê ya dibistanên pêşvebir li Herfordê

Tevahiya navîgasyona dibistanê li jêr e:
www.herford.de/schulnavigator

Piştgiriya wergerê di çarçoweya programa welatî de
pêk tê ango,
WERE NRW-Ê".„

Dêûbavên hêja,

Zarokê we niha di sinifa 4. de ye. Ew ê di nêz de here dibistaneke pêşvebir. Ji bo we û zarokê we niha gelek pirs hene:

- Ev ê çawa pêş ve here?
- Pêşniyara dibistana seretayî çi ye?
- Em ê çawa bi hev re dibistana pêşbir ya rast bibînin?

Di vê nîvsalê de em ê pêşniyara dibistanekê bo zarokê we bikin, ku ev pêşniyar dê wekî oryantasyon bibe alîkar bo zarokê we bizanibe, ku ew here kîjan dibistana pêşvebir. Bajarê Hansa Herford xwedî dibistanên curbicur û zindî ye. Gymnasyum, 3 Dibistanên Real, Dibistaneke Giştî û Dibistaneke Piştgir hene. 3

Bi vê broşurê re em dibistanên pêşvebir bi we didin zanîn ku li bajarê Hansa Herfordê ne. Tevahiya dibistanên li bajarê Hansa Herfordê xwedî profîleke xweser, baldariya (fêrbûnê) xweser in. Fêrbûna van agahiyan dê ji we re bibe alîkar, ku hûn biryarek bistînin.

Mamosteyên xwedî motîvasyon û zanyariya herî bilind dê bi piştgiriya herî pêkan heta qedandina dibistanê rêhevaltiya zarokê we bikin. Her wisa dema ders, konseptên li gel yên pedagojîk û pêşkêşiyên têkildar wekî firavîn, lênêrîn ya dibistana gişrojî dê ji bo we kêrhatî bin.

Peywira Bajarê Hansa Herford ew e, ku bi heyiyên pisporî û odesazî, ku bingeha saziyane ji bo klîmayeke baş ya fêrbûnê pêk tîne, bixe meriyetê, da ku perwerdeya zarokên me pêk bê. Bajarê Hansa Herford bi rêkûpêk bo xizmetê alîkarî dide dibistanan. Tenê di nav 6 salên dawî de 12 Mîlyon Euro pere bo xizmetê razandiye. Herî zêde alîkarî bo beşên biyolojî, kîmya û fîzîk hat kirin. Ev pere ji bo kareke baş hatiye xerckirin, ji ber ku me vê pereyê ji bo siberoja zarokên xwe xerc kiriye.

Ez baş dizanim, ku hûn ê li bajarê me dibistaneke bi dilê xwe ji bo zarokê xwe bibînin, ku şertên fêrbûnê herî baş in û ez ji bo we û zarokê we destpêkeke baş li dibistana nû hêvî dikim.

Bi dilxwazî

Birgit Froese-Kindermann
Encûmana bo perwerde, ciwan û sosyalê

JI DIBISTANA SERETAYÎ BER BI DIBISTANA PÊŞVEBIR VE

Dibistana Seretayî

Zarokê we salên berê diçû Dibistana Seretayî. Mamosteyên li wê derê dizanin, ji bo zarokê di fêrbûnê de çi hêsan e û çi belkî hêj zehmet e. Dibistana Seretayî pêşniyariyek dike, ku kîjan dibistana pêşvebir ji bo zarokê we baş e, da ku zarokê piştgirî û hêz bistîne. Li Nordrhein-Westfalen dêûbav biryar didin, ku zarokê wan here kîjan dibistanê. Ji bo vê li tevahiya Dibistanên Seretayî derfeta şêwirmendiya takekes heye.
Bi mamoste û xebatkarên din yên pedagojîk yên Dibistana Seretayî re di derbarê vê pêşniyarê de biaxivin. Divê hûn pêşniyara Dibistana Seretayî cidî bigirin.

Roja bo serdana her kesî

Hûn bi zarokê xwe re sûdê ji roja bo serdana her kesî bigirin. Tevahiya dibistanên pêşvebir di mehên mijdar, kanûn û çileyê de ‘’rojên derfetê’’ yên bi vî rengî pêk tînin. Hûn dikarin serdana sinifên dersê bikin û mamsoteyan nas bikin. Li hinek dibistanan her wisa dersên bo nîmûne ji bo zarokan tên pêkanîn. Nêrînên pêşîn girîng in. Ew dikarin di derbarê biryara li ser dibistanê ji bo we û zarokê we bibin alîkar.

Qeydî

Bi bawernameya nîvsalî û pêşniyara Dibistana Seretayî re zarokê xwe li dibistana ku we biryar li ser daye qeyd bikin. Rojên hevdîtinan dê di çapemenî û înternetê de di demeke rast de bên diyarkirin. Rojên hevdîtinên bo qeydiyê dê her wisa ji aliyê rêveberiya dibistanê ve bo we bi nivîskî bê şadin. Li Herfordê Dibistaneke Giştî, 3 Dibistanên Real û 3 Gymnasyum hene.

Ji bo qeydiya zarokê we li dibistaneke pêşvebir pêdiviya we bi van belgeyan heye:

- Sertîfîkaya jidayikbûnê yan jî belgeya secereyê
- bawernameya herî dawî ya zarokê we ku pêşniyara Dibistana Seretayî li gel
- planên piştgir yên pêkan
- Di rewşa mafê lênêrîna takekesî de biryara mehkemeyê.

şertê qebûlkirina bo sinifa 5. ew e, ku qedandina bi awayekî serkeftî ya Sinifa 4. ya Dibistana Seretayî.

Tevahiya rêvebirên dibistanê di tevahiya rojên bo qeydkirinê de ji bo bersiv û şêwirmendiyê bo we amade ne.

Bawername

Li dibistanan bidestxistina bawernameyên curbicur pêkan e.

Ev hene:

- Bawernameya Dibistana Bingehîn piştî sinifa 9
- Bawernameya Dibistana Bingehîn piştî sinifa 10
- bawernameya Dibistana Navîn piştî sinifa 10 (Amadebûna bo dibistana jorîn ya pîşeyî) – bi û bêyî danasîna kanînê
- Abitura Pîşeyî – beşa dibistanî
- Abitur

Divê her zarok li gorî karînên xwe bawernameya herî baş û pêkan bi dest bixe. Piştî sinifa 10. xwendekar dikarin bi bawernameyeke zanyarî li ser barkirî dibistana xwe bo Gymnasyum, Dibistana Giştî yan jî Koleja Pîşeyê biguherînin, bo ku Abitura Pîşeyî yan jî Abitur bi dest bixin.

Şêwirmendî

Li vê derê hûn dikarin di derbarê çûna dibistana pêşvebir de bişêwirin.

- **Saziya Dibistanê bo Devera Herford**
  3Amtshausstr.
  Herford 32051
  1469-13 05221Telefon:
  yan jî li gel
- **Şêwirmendiyên dibistanê yên herêmî yên Devera Herford**
  Ravensberger Str. 6
  Herford 32051
  60 98 84 2 05221Telefon:

Pêdiviya Piştgiriyê/Hewandinê

Pêdiviya zarokê we bi piştgiriyê heye? Fêrbûna bi hev re ya zarokên têkel yên pêdiviya wan bi piştgiriyê heye û tune ye li çar dibistanên pêşvebir yên Herfordê di vê demê de pêk tê:

- Ernst-Barlach-Dibistana Real
- Dibistana Giştî ya Friedenstal
- Königin-Mathilde-Gymnasyum
- Otto-Hahn-Dibistana Real

Hûn ji **roja bo serdana her kesî** ya li van dibistanan sûdê bigirin û rasterast pirsên li ser „fêrbûna bi hev re" û derfetên piştgiriyê bo zarokê xwe bikim.

heqê riya xwendekaran

Xwendekarên , ku bêhtirî 3,5 Kilometre ji dibistana pêşvebir ya herî nêzîk dûr dijîn, xwedî mafê li ser bilêta bo çûnûhatina bo raya giştî ne. Hûn dikarin agahiyên berfireh yên di derbarê heqê riya xwendekaran de li gel Bajarê Hansa Herford bi dest bixin, Telefon 05221 189-646.

KÎJAN DIBISTAN LI GORÎ ZAROKÊ WE YE?

Ev formên dibistanê li Herfordê hene:

DIBISTANA GIŞTÎ

- perwerdeya giştî ya dorvekirî û kûr
- Amadekariya bo perwerdeyeke pîşeyî yan jî xwendina zanîngehê
- Oryantasyona tempoya fêrbûnê li ser zanîn û karînên zarokan

Dibistana Giştî xwendekaran hem ji bo perwerdeyeke pîşeyî hem jî ji bo xwendina li zanîngehekê amade dike. Xwendekar dikarin bi karînên fêrbûnê yên curbicur li Dibistana Giştî bi hev re fêr bibin. Li Dibistana Giştî zarok dikarin xwe di demeke berfireh de xwe pêş bixin û tevahiya bawernameyan bi dest bixin. Xwendekarên keç Û xort, yên bêhtir dem ji bo fêrbûna wan pêwîst e, li Dibistana Giştî bêhtir dem didin wan.

Ders di hinek beşên xwendinê de di asta bingehîn de û asta berfireh de tê dayîn, ji bo ku zanîn û karînên curbicur yên xwendekaran li ber çav bê girtin. Bi vê re her zarok li gorî hêza fêrbûna xwe piştgirî distîne û daxwaz jê tê kirin.

Qet**astên cerebeyê tune ne**, ji bo ku tu zarok piştî sinifa 6. Mecbûr nemîne ku dibistanê biterikîne.

Bi serlêdana dêûbavên zarokan derfeta dubareya sinifê bo zarokan heye lê eger zarok bikaribin bi vê yekê re bêhtir piştgirî bistînin.

Mirov dikare piştî 13 salên xwendina dibistanê Abitur bi dest bixe.

Li Dibistana Giştî mirov dikare tevahiya Bawernameya di Asta Navîn I û Asta Navîn II de bi dest bixe:

- Bawernameya Dibistana Bingehîn piştî sinifa 9
- Bawernameya Dibistana Bingehîn piştî sinifa 10
- — Bawernameya Dibistana Navîn (Amadebûna bo dibistana jorîn ya pîşeyî) bi û bêyî danasîna kanînê
- Amadebûna Zanîngeha Pîşeyî (Abitura Pîşeyî) – beşa dibistanî
- Amadebûna giştî ya bo Zanîngehê (Abitur).

Li Bajarê Hansa Herfordê ev Dibistana Giştî heye:

- **Dibistana Giştî Friedenstal.**

DIBISTANA REAL

- perwerdeya dorfireh û giştî
- piştgiriya karînên pratîkî
- hişyarkirina baldariyên li ser têkiliyên teoriyê

Dibistana Real perwerdeya dorfireh û giştî dide. Karînên pratîkî her wisa piştgirî dibînin, wekî ku baldariyên li ser têkiliyên teoriyê piştgirî dibînin. Bi armanca bo perwerdeyeke pîşeyî naverokên di derbarê pîşeyan de di tevahiya beşên xwendinê de tên berçavkirin.

Piştgiriya bo şiyaneyên taybet

Dibistanên Real dikarin rasterast poştgiriya şiyaneyên taybet bikin û hin baldariyên din li dersan zêde bikin. Li gel beşên bingehîn yên dersên li Dibistanên Real her wisa dersên dorpêç jî tên dayîn. Di van dersan de xwendekar wekî din bêhtir piştgirî digirin. Bo nîmûne di beşên wekî Almanî, matematîk, zimanên biyanî, zanistên xwezayî û hînkeriyên li ser pîşeyan.

Li Dibistana Real mirov dikare van bawernameyan bi dest bixe:

- Bawernameya Dibistana Bingehîn ya wekî bawernameya piştî sinifa 9
- Bawernameya Dibistana Bingehîn ya wekî bawernameya piştî sinifa 10
- bawernameya Dibistana Navîn (Amadebûna bo dibistana jorîn ya pîşeyî) -bi û bêyî danasîna kanînê.

bawernameya Dibistana Navîn ya herî kêm bi notên memnûn di tevahiya beşên xwendinê de mafê dide ku xwendekar here asta bilind ya gymnasyumî ya li Gymnasyumê **yan jî** here Dibistana Giştî **yan jî** Gymnasyuma Pîşeyî li koleja pîşeyî.

Eger notên xwendekarê yan jî xwendekarî piştî dawiya sinifa 10 bi taybet baş be, derî li pêş derfeta bo destpêkirina qonaxa hînkeriya bo asta bilind ya gymnasyumî li Gymnasyuman yan jî Dibistanên Giştî vedibe. Beşdariya bo dersa zimaneke din ya biyanî ji sinifa 6 heta sinifa 10 ji bo vê yekê şert e.

Sinifên 5 û 6 di Dibistana Real de asta cerebeyê pêk tînin. (binêre her wisa rûpel 7)

Li Bajarê Hansa Herfordê ev Dibistanên Real hene:

- **Ernst-Barlach-Dibistana Real**
- **Otto-Hahn-Dibistana Real**
- **Geschwister-Scholl-Dibistana Real**

GYMNASYUM

- Perwerdeya kûr û giştî
- Nîqaşên li ser pirsyariyên tevlihev
- Amadekariya bo xwendina zanîngehê

Gymnasyum perwerdeyeke kûr ya giştî dide, ku hem zanyariya bo xwendina zanîngehekê hem jî bo perwerdeyeke pîşeyî pêk tîne. Divê ders pêşî li nîqaşên pirsyariyên tevlihev veke û piştgiriya ramana rexneker bike.

Ev xwedî pêvajoyeke berdewamî ya perwerdeyê ye ku tê de hem asta duyemîn I (Sinifa 5 heta 10) hem jî asta bilind ya gymnasyumî ya sêsalî (asta duyemîn II) cih digirin.
Di sinifên 5 heta 7 nêzîkî tevahiya beşên xwendinê yên beşa peywirî piranî li yekîtiya sinifan ders tê dîtin.

Gymnasyum dibe alîkar ku xwendekar piştî sala xwendinê ya 2018/2019 piranî piştî 13 salên dibistanê Amadebûna Zanîngehê ya giştî bi dest bixin. Gymnasyum li gorî daxwazan xwedî derfet in, ku Abitur bi 12 salên dibistanê li wan bê bidestxistin.
Li gorî baldariya xwe li Gymnasyumê pirsên xwe bikin!

Li Gymnasyumê mirov dikare tevahiya bawernameyên asta duyemîn I û II bi dest bixe:

- Amadebûna Zanîngeha Pîşeyî (Abitura Pîşeyî) – beşa dibistanî
- Amadebûna Zanîngehê (Abitur)

Die gymnasiale Oberstufe oder das berufliche Gymnasium setzen den Bildungsgang der Sekundarstufe I fort und schließen in der Regel mit der Abiturprüfung ab.

Li Bajarê Hansa Herfordê ev Gymnasyum hene:

- **Friedrichs-Gymnasyum**
- **Königin-Mathilde-Gymnasyum**
- **Ravensberger Gymnasyum**

ASTA CEREBEYÊ LI DIBISTANA REAL Û LI GYMNASYUM

Sinifên 5 û 6 li Dibistana Real û Gymnasyumê asta cerebeyê pêk tînin. Di vê demê de xwendekar bêyî ku bên transferkirin derbasî sinifa jorê ya li pêş xwe dibin. Di dawiya sinifa 6. de hêza karînan ya zarokî, not û pêşketinên wî yên tên hêvîkirin Biryar didin, ku zarok di vê forma sinifê de dimîne, vê salê dubare dike yan jî divê here formeke din ya dibistanê.

Eger guhertina dibistanê pêwîst be, dibistan herî dereng şeş hefte beriya dawîbûna sala dibistanê formeke din ya dibistanê bo dêûbav pêşniyar dike.

DIBISTANA PIŞTGIR

Xwendekarên pêdiviya wan bi piştgiriya taybet heye dikarin her wisa li Dibistanên Piştgir der bibînin. Heft cureyên baldariya piştgiriyê hene:

- Fêrbûn
- Ziman
- Pêşketina hîsî û sosyal
- Dîtin
- Bihîstin û Komunîkasyon
- Pêşketina giyanî
- Pêşketina laşî û motorî.

Dibistanên Piştgir yên xwedî baldariya piştgiriyên wekî „Dîtin“ ,„Bihîstin û Komunîkasyon“ û „Pêşketina laşî û motorî“ li derveyî deverê hene. Agahiyên di derbarê vê de hûn dikarin li Saziya Dibistanê bigirin.

Dibistaneke Piştgir dibistaneke ji bo zarokên, ku li dibistanên ji rêzê hîç yan jî kêm piştgirî dikarin bistînin e. Hûn bi xwe ne ewle ne, ku zarokê we here Dibistana Piştgir yan na? Bi mamosteyên Dibistana Seretayî re biaxivin û bi wan re bişêwirin. Hûn dikarin her wisa bi Saziya Dibistanê ya Devera Herfordê yan jî navendên şêwirmendiyê yên herêmî bo Devera Herfordê bişêwirin – binêre her wisa rûpel 3.

Li gorî her pêdiviyên piştgiriyê li vê deverê dibistanên li gorî van baldariyên piştgiriyê hene:

- **Albert-Schweitzer-Dibistan, Herford**
  Baldariya piştgiriyê: Dibistana tevahiya rojê bo asta fêrbûn, destpêk û navîn
- **Eickhofschule, Hiddenhausen**
  Dibistana piştgir bo pêşketina sosyal û hîsî
  Asta navîn I
- **Wittekindschule, Hiddenhausen**
  Baldariya piştgiriyê: Ziman
- **Johannes-Falk-Haus, Hiddenhausen**
  Baldariya piştgiriyê: Pêşketina giyanî

Mor

© Bajarê Hansa Herford

Midûriya Perwerde, Ciwan û Sosyalê
Bajarê Hansa Herford
Beşa Perwerde û Sporê
Rathausplatz 1
Herford 32052
Telefon 05221 189-731
Faks 05221 189-533

Berpirsyar di warê mafê çapemeniyê de:

Bajarê Hansa Herford
Şaredar

Redaksiyon:
Beşa Perwerde û Sporê,
Elmar Boenig, Heidi Pahmeyer

Nivîs:
Elmar Boenig, Susanne Körner

2018**Pêkhatin:**